

Kolonyalizm û Postkolonyalizm di Helbestên Rênas Jiyan de
(Colonialism and Postcolonialism in the Rênas Jiyan Poems)
(Rênas Jiyan'ın Şiirlerinde Kolonyalizm ve Postkolonyalizm)

Mazhar ÇİFTÇİ •

Article Type: Research Article // Gotara Lêkolînî**Received // Hatîn:** 30.12.2024**Accepted // Pejirandin:** 12.02.2025**Published // Weşandin:** 30.04.2025**Pages // Rûpel:** 44-66**DOI:** 10.55106/kurdiName.1610281This work is licensed under the Creative Commons
Attribution-NonCommercial 4.0 International
License (CC BY NC)<https://creativecommons.org/licenses/by-nc/4.0/>**Citation/Atif:** Çiftçi, Mazhar, *Kolonyalizm û Postkolonyalizm di Helbestên Rênas Jiyan de*, 2025, KurdiName, 12, r.44-66**Plagiarism/Întihal:** This article has been reviewed by at least two referees and scanned via ithenticate plagiarism website
// *Ev gotar herî kêr ji aliyê 2 hakeman va hatiye nirxandin û di malpera întihalê ithenticate ra hatiye derbaskirin.***Kurte**

Mirov dikare kolonyalizmê wekî hegemonyaya serdestan a li ser bindestan pêname bike. Armanca kolonyalizmê bi zordarî temînkirina keresteyên sererd û binerd ên koloniyê ye ji bo metropolê. Kolonyalist ji bo ku keresteyan ji koloniyê temin bikin rêbazên curbicur ên tundrew bi kar tînin. Postkolonyalizm jî wek rexne û teoriyekî, pêkanînen fizîkî yê dewra kolonyalizmê yê wekî kuştin, sirgûnkirin, talankirin hwd û herwiha pêkanînen hegemonîk yê wekî asimilasyon nebanbûn, nasname, zayend û hwd ji hev vedişîrîne û deşîfre dike. Em ê di vê xebata xwe de di peywendî têgihên kolonyalizm û postkolonyalizmê de helbesta nû/modern ya Kurmancî de di mînakê helbestên Rênas Jiyan de binirxînin û xusûsen rengvedanên postkolonyalizmê di helbestên Rênas Jiyan de hêlengînin. Ji ber wê jî çarçoveya xebata me tenê li ser helbesta Kurmancî ya nû/modern de di mînakê helbestên Rênas Jiyanî de ye. Ji ber ku peywendî xebata me li ser bîngeha têgihên kolonyalizm û postkolonyalizmê dê bê kirin em ê ewilî li ser van her du têgihan rawestin. Piştî rewşa Kurd û Kurdistanê li ser bîngeha van her du têgihan dê bê nirxandin û di axiriyê de baxusûs hin rengvedanên di kolonyalizmê jî di helbestên Rênas Jiyanî de dê bê nirxandin. Di vê xebata xwe de em têgihîştin ku pêkanînen kolonyalist ên li Kurdistanê û rengvedanên wê, bi teoriya postkolonyalizmê di helbestên Rênas Jiyan de hin caran bi eşkereyî û hin caran jî bi amajeyî ji hev hatine veçirandin û deşîfrekirin. Piştî deşîfrekirina pêkanînen kolonyalist ên li Kurdistanê bi teoriya postkolonyalizmê, di axiriyê de hin rengvedanên di kolonyal jî xuya dibin di helbestên Rênas Jiyanî de.

Peyvên Sereke: Kolonyalizm, postkolonyalizm, Rênas Jiyan, helbest**Abstract**

One can define colonialism as the hegemony of the rulers over the oppressed. The goal of colonialism is to forcefully provide the surface and underground resources of the colony for the metropolis. The colonialists used a variety of extreme methods to secure supplies from the colony. Postcolonialism, as a critique and theory, separates and deciphers the physical practices of the colonial period such as murder, deportation, looting, etc. and also breaks down and deciphers hegemonic practices such as assimilation, alienation, identity, gender, etc. In this work, we will evaluate the new/modern Kurmanci poetry in relation to the concepts of colonialism and postcolonialism in the example of Rênas Jiyan's poems and we will especially evaluate the

*Xwendekarê Doktorayê, Zanîngeha Bîngolê, Enstîtuya Zimanên Zindî, Tûrkiye, mezherekale@gmail.com,
ORCID: 0000-0001-8315-9049

PhD student, Institute of Living Languages, University of Bingol, Tûrkiye, mezherekale@gmail.com,
<https://orcid.org/0000-0001-8315-9049>

expressions/reflections of postcolonialism in Rênas Jiyan's poems. Because of that, the scope of our work is only in the new/modern Kurmanci poetry, in the example of Rênas Jiyan's poems. Since our work will be based on the concepts of colonialism and postcolonialism, we will first focus on these two concepts. Then the situation of Kurds and Kurdistan will be evaluated on the basis of these two concepts, and finally, some expressions/reflections of anti-colonialism in the poems of Rênas Jiyan will be evaluated. In this work, we came to the conclusion that the colonial practices in Kurdistan and its reflections, with the theory of postcolonialism in the poems of Rênas Jiyan, sometimes openly and sometimes subtly, have been separated, analyzed and deciphered. After deciphering the colonial practices in Kurdistan with the theory of postcolonialism, finally some anti-colonial reflections appear in the poems of Rênas Jiyan.

Keywords: Colonialism, postcolonialism, Rênas Jiyan, poetry

Özet

Kolonyalizm, egemenlerin ezilenler üzerindeki hegemonyası olarak tanımlanabilir. Kolonyalizmin amacı, koloninin yer üstü ve yer altı kaynaklarını zorla metropolün hizmetine sunmaktır. Kolonyalistler koloniden kaynak temin edebilmek için çeşitli zora dayalı yöntemler kullanırlar. Bir eleştiri ve teori olarak postkolonyalizm ise, sömürge döneminin cinayet, sürgün, yağma vb. fiziksel pratiklerini ve ayrıca hegemonyaya dayalı asimilasyon, kimlik, yabancılaşma, cinsiyet vb. pratikleri analiz edip deşifre etmektedir. Bu çalışmamızda yeni/modern Kurmanci şiirini kolonyalizm ve postkolonyalizm kavramlarıyla bağlantılı olarak Rênas Jiyan'ın şiirleri örneğinde değerlendireceğiz ve özellikle Rênas Jiyan'ın şiirlerindeki postkolonyalizm ifadelerini/yansımalarını değerlendireceğiz. Bu nedenle çalışmamızın kapsamı yeni/modern Kurmanci şiirinde, sadece Rênas Jiyan'ın şiirleri örneğinde olacaktır. Çalışmamız kolonyalizm ve postkolonyalizm kavramlarını temel alacağından öncelikle bu iki kavrama odaklanıp, her iki kavramı açıklamaya çalışacağız. Daha sonra bu iki kavram çerçevesinde, Rênas Jiyan şiirlerinde Kürtlerin ve Kürdistan'ın durumu değerlendirilecek, son olarak da Rênas Jiyan'ın şiirlerindeki kolonyalizm karşıtlığının bazı ifadeleri/yansımaları değerlendirilecektir. Bu çalışmamızda Rênas Jiyan'ın şiirlerinde postkolonyalizm teorisi ile Kürdistan'daki kolonyalizm uygulamaları ve yansımalarının bazen açık bazen de üstü örtülü bir şekilde ayrıştırılarak, analiz edilerek, deşifre edildiği, ortaya çıkarıldığı sonucuna ulaştık. Kürdistan'daki kolonyalist uygulamalar postkolonyalizm teorisiyle deşifre edilip analiz edildikten sonra, en sonunda da Rênas Jiyan'ın şiirlerinde kolonyalizm karşıtı bazı yansımalar da ortaya çıkmaktadır.

Anahtar Kelimeler: Kolonyalizm, postkolonyalizm, Rênas Jiyan, şiir

Destpêk

Têgihên kolonyalîzm û postkolonyalîzmê baxusûs piştî rûdana kapîtalîzmê li seranserê dinyayê xusûsen di nava neteweyên kolonîzekirî û bindest de di warê sîyasetê de gelek nîqaş û herwiha di warê akademîyayê de gelek lêkolîn û vekolîn li ser hatine kirin. Wekî her neteweyeke kolonîzekirî yan bindest an jî bêstatû, Kurdan jî di warê sîyasetê de xusûsen li ser kolonyalîzmê gelek nîqaş kirine, lê di warê akademîyayê de li ser kolonyalîzm û postkolonyalîzmê kêmtir lêkolîn û vekolîn hatine kirin. Wekî ku tê zanîn di warê sîyasî de di salên 1970yî de li Kurdistana Bakur gelek nîqaş hatine kirin, lê di warê akademîyayê de anca di 20 salên dawî de xebatên li ser kolonyalîzm û postkolonyalîzmê hatine kirin. Lê ji ber ku çarçoveya xebata me tenê li ser bakurê welêt e em ê jî di peywenda kolonyalîzm û postkolonyalîzmê de tenê li ser bakurê welêt rawestin.

Gelo têgiha kolonyalîzm û postkolonyalîzm tê çi maneyê, kîngê derketîye mexderê, di çi maneyan de hatîye bikaranîn? Gelo tenê cureyeke kolonyalîzmê heye yan gelek cureyên wê hene? Pîvanên kolonyalîzmê çi ne ku welatek an jî civakek wekî kolonîyekî bê hesibandîn? Kolonyalizm çi texribatan li ser welatê kolonîzekirî, li ser civaka kolonîzekirî û herwiha li ser kesayetên kolonîzekirî dihêle ku ev pirs tevayî dikeve warê têgiha postkolonyalîzmê?

Herwiha gelo çi cure bertek û bergirîyên dij-kolonyal an jî dekolonyal hatine nîşandan xusûsen di warê edebîyatê de ku peywenda xebata me li ser vê pirsê ye? Em ê di beşa ewil de hewl bidin ku bersivên van pirsan bidin.

Di beşa duyem de em ê di peywenda kolonyalîzm û postkolonyalîzmê de rewşa Kurd û Kurdistanê û xusûsen jî rewşa Bakurê Kurdistanê binirxînin. Ka gelo Kurdistan welatekî kolonyal e û civaka kurd jî civakeke kolonyal û bindest e? Ku Kurdistan welatekî kolonyal û civatek kolonîzekirî be gelo çi cure kolonyalîzmek li dar e li Kurdistanê? Ku Kurdistan welatekî kolonyal be gelo çi cure texrîbat û trawmayên postkolonyal li ser welat, civak û kesayetên kurdan çêbûne? Em ê di beşa duyem de li dû bersivên van pirsan bikevin û li gor bersivan nirxandinên xwe bikin.

Di beşa sêyem de ku bingeha xebata me ev beş e em ê li dû nîşan, amaje û rengvedanên kolonyalîzm û postkolonyalîzmê û herwiha li dû bertek û bergirîyên dijkolonyal an jî dekolonyal di helbesta nû ya Kurmancî de di mînaka helbestên Rênas Jîyan bikevin. Pêwendîya rengvedanên kolonyalîzm û postkolonyalîzmê û herwiha bertek û bergirîyên dijkolonyalîzm an jî dekolonyalîzmê û edebîyatê çi ye? Gelo rengvedanên kolonyalîzm û postkolonyalîzmê û herwiha dijkolonyalîzm û dekolonyalîzmê di helbestên Rênas Jîyan de hene? Ku hebe gelo Rênas Jîyan bi çi awayî rengvedanên kolonyalîzm û postkolonyalîzmê û herwiha dijkolonyalîzm û dekolonyalîzmê di helbestên xwe de amaje pê kirîye an jî rasterast behs kirîye? Herwiha em ê di vê beşe de jî li dû bersivên van pirsan bikevin.

1. Kolonyalîzm û Postkolonyalîzm

1. 1. Kolonyalîzm

Li gorî Loombayê *“peyva kolonyalîzmê ji peyva latînî ya ‘colonia’yê tê, ku tê maneya ‘çewlik’ an jî ‘wargehê’ û amaje bi wan hemwelatîyên Romayê dike ku ew hemwelatî her çiqas li deverine din binecîh bibin jî wek hemwelatîyên Romayê hatine hesibandin.”* (Loomba, 2000: 18). Lê wekî Loomba jî amaje pê dike, zehf ecêb e wexta ku hemwelatîyên Romayê li devereke din wargeheke nû ava dikin qet behsa niştecihên wan deveran nayê kirin. Kolonyalîzm helbet li deverên cuda yên dinyayê wekî pêvojeyê hevbeş nehatîye meşandin. Lê wekî ku amaje pê hatîye kirin li erdnigarîyê nû pêvajoya ‘damezirandina coloniayeke nû’ bi awayekî îcbarî tê maneya xirabkirin û jinûve fesilandin civakeke nû û herwiha di wê pêvajoyê de tê maneya gelek qewimînên wekî ticaret, şer, qirkirin, kolekirin, berxwedan û hwd. ku li wê derê rû didin.

Li gorî Ania Loombayê mirov dikare kolonyalîzmê bi awayekî herî zelal wiha pênase bike, ‘zeftkirin û qontrolkirina erd, mal û milken mirovên din’. Wekî ku Loomba jî behs dike ger ku mirov li gor peywenda vê pênaseyê kolonyalîzmê binirxîne di tarîxa mirovayetiye de gelek qewimînên kolonyalist rû dane yên wekî Romayîyan, Moxolan, Aztekan, Seferên Xaçperestan hwd. Lê her çiqas gelek tevgerên kolonyalist di tarîxa mirovayetiye de rû dabin jî cîyawazîyek heye di navbera kolonyalîzma berîya kapîtalîzmê û ya piştî kapîtalîzmê de. Ji ber ku kolonyalîzma piştî kapîtalîzmê birêkûpêktir û sistematîktir e. *“Kolonyalîzma modern ji welatên kolonîzekirî ji berhevkirina xerac, mal û dewlemendîyê zêdetir tişt kirin, ekonomîya welatên kolonîzekirî jinûve fesilandin, ekonomîya wan bi ya xwe ve bi têkilîyên têkel ve bi hev ve girêdan, bi vî awayî di navbera welatên kolonîzeker û yên kolonîzekirîyan de danûstandinên mirovî û çavkanîyên sererd û binerdî dest pê kir.”* (Loomba, 2000: 21). Lê her

çi danûstandin hatibe kirin ked û xebat ji kîsikê kole û xebatkarên kolonîzekirîyan çûye û feyde ji hemû ketîye bêrika efendîyên kolonîzekeran.

Teorîsyenêkî din ê kolonyalîzmê jî bêguman Aime Cesaire ye. Ew jî pîrsa ka gelo kolonyalîzm çi ye li xwe dike, li şûna ku bersiva pîrsa xwe rasterast bide bi awayekî berevajî yan jî bi awayekî nerasterast bersiva pîrsa xwe bi mebesta nîyetxirabîya kolonyalîstan wiha dide: “*Kolonyalîzm fêrkirina Încîlê nîne, pêngaveke bixêr nîne, arezûya bertengkirina sînorên zordarîyê, nexweşîyan û cehaletê nîne, plansazîyeke bi mebesta berzîkirina Xwedê nîne, hewldana berfirehkirina sîstema edaletê nîne.*” (Cesaire, 2007: 64). Cesaire piştî beyanatên ku mebesta kolonyalîzmê bi awayekî berevajî îfşa dike, di berdewamîya beyanatên xwe de vê carê jî bi awayekî rasterast wêfên kolonyalîzmê eşkere dike. “*Bêyî ku çi were serê me em jê bitirsîn, wekî gotineke ewil û ya dawî divê em qebûl bikin ku kolonyalîzm, di şexsîyeta aktorên tayînkirî yên wekî maceraperest û korsan de, di şexsîyeta perakendefiroş û xwedîyê keşîyê de, di şexsîyeta defînerê zêran û tucar de, di çavsorî û hêzê de û hêj ji van jî wêdetir, ji ber sedemên hundirîn, di demeke dirêj de ya eyan de, sîya şeytanî ya medenîyetekê ye ku xwe mecbûr hîs dike da ku pêşbazîya cîhanî ya di navbera aborîyên dijberên xwe de parve bike.*” (Cesaire, 2007: 65) Lê gelo wexta ku kolonîzeker ji bo berjewendîyên xwe ewqas talan û kuştinan dikin, mirovên kolonîzekirî ji mirovahîyê derdixin ku van kirinên xwe jî hemû li ser navê medenîkirina weşîyên paganî dike, gelo çi berdêlan dide? “*Mêtinkar ji bo ku wijdana xwe teskîn bike, dê insanê xwecih wekî heywanekî bibîne û dê wisa pê re miemele bike; lê berdêla vê yekê ev e, dê ew jî bibe wek heywanekî. Ev, tesîra bumerang a mêtinkariyê ye.*” (Alan, 2015: 44)

Remezan Alan zêdetir li ser kolonyalîzma modern disekine ya ku bi seferên cografîk re destpêkirî û di peywenda modernîte, kapîtalîzm, ronakgerîya ewrûpî, emperyalîzmê û oryantalîzmê de kolonyalîzma modern dinirxîne. “*Di vê serdemê de weşîyên deverên dûr, ji aliyê efendîyekî Rojavayî ve hatiye şarezakirin.*” (Alan, 2015: 44). Wekî ku hatiye behskirin kolonyalîzma modern an jî ya piştî kapîtalîzmê jî ya berî kapîtalîzmê birekûpêktir û bipergaltir bûye. Dewletên kolonyal ji bo ku sîstema xwe ya mêtîngerîyê bi awayekî tekûz cîbicî bikin di pêş de efser, dîplomat, akademîsyen an jî di dilqên wan de seyyah dişandine welatên ku dixwestin kolonîze bikin, ji bo ku di derbarê wan welatan de ji wan re zanyarî/agahîyên pêwîst berhev bikin. “*Ji van zanistan ya herî navdar şarqiyat/oryantalîzm e ku arkelojiya wê ji aliyê Edward Said ve hatiye kirin. Li gor Said ev zanista ha, hem wek wecheyekî emperyalîzmê û hem jî wek yê mêtinkariyê xebitiye.*” (Alan, 2015: 44)

Dilawer Zeraq zêdetir li ser ferqa navbera kolonyalîzma pêşkapîtalîzmê û ya piştî kapîtalîzmê disekine, ya pêşkapîtalîzmê wekî mêtîngerîya kevnereng û ya piştî kapîtalîzmê jî wekî mêtîngerîya rengmodern pênase dike ku cîyawazîya wan ji xurtbûn û zalbûna wan tê. Zeraq, kolonyalîzma pêşkapîtalîzmê wiha pênase dike: “*ji ber ku hêza mêtîngerîya kevnereng ne xurt e di demajoya dirêj de jî de nikaribe xwedî rengûawayekî kudbar (domdar).*” (Zeraq, 2022: 22). Herwiha kolonyalîzma piştî kapîtalîzmê ya rengmodern jî têkilîya wê bi modernîzmê û avabûna neteweyên dewletan ve girê dide. Lê ji bilî van her du cure kolonyalîzman Zeraq behsa cureyekî kolonyalîzma din jî dike û wekî ‘mêtîngerîya navsînorî’ pênase dike. Li gorî Dilawer Zeraq ku zêdetir ji Miroslav Hroch û ji Antony Smith sîd wergirtiye, du cure neteweyên hene ku yek neteweyên mezin ya din neteweyên piçûk in. Neteweyên mezin ên wekî Fransa, Almanya û Îngilistanê ji berê de xwedî rêveberî, ax û ziman in û di dema modernîzmê û kapîtalîzmê de jî ‘çîneke wan a sêyem’ peyda bûye û

reveberîya wan dewletan hildane destên xwe. Lê neteweyên piçûk ji dema împaratorîyan ve wekî bindestên neteweyeke serdest mane û bi wî awayî pevgirêdaneke wan çêbûye. Lê bi derketina modernîzm û netewe-dewletan re jî ji ber peydanebûna çîneke wan a serdest û nebûna sazûmaneke wan a siyasî terîtoryaya wan di nav sînorên netewe-dewletên avabûyî maye.

Cuma Çîçek jî ku zêdetir di warê polîtîkayên zimanî yên dagirkerîyê de xebata xwe domandîye, li gorî wî sê serdemên dagirkerîyê hene. *“A yekem dagirkeriya klasik e ku li vir civakeke herêmi ji aliye hêzeke biyanî ve tê desteserkirin. Serdema duyemîn dagirkeriya hundirîn e ku li vir di nav sînorekî heyî de serdestiya neteweyekî li ser netewe yan jî neteweyên din hene. A dawî dagirkeriya nû ku ji bo serdestiya neteweyên endustrîya wan bi pêş ketiye û li ser cîhana sêyemîn hukum dikin.”* (Çîçek, 2013: 42).

Li gorî Çîçek di polîtîkayên zimanî yên dagirkerîyê de du faktorên sereke hene. Yek şarezakirina/nijadperestîya etnîkî û olî ye ku zêdetir rêbaza dagirkerîya Fransewî ye. Ya duyem birêvebirin/kontrolkirin e ku ev jî rêbaza dagirkerîya Brîtanîyayî ye. Ji bo ku polîtîkayên zimanî yên dagirkerîyê pêk bên amûrên herî karîger dibistan/perwerdehî, qada rewşenbîrîyê û bi taybetî dibistanên leylî ne. Tesîrên vê hegemonyaya zimanî û çandî herî zêde di îdareyê û bazarê de xuya dibe. Bîyanîbûn/nebanîbûn, zimankujî û aloziyên etnîkî/olî jî encamên polîtîkayên dagirkerîyê ne, bi taybetî yên zimanî.

Akademîsyen Gullistan Yarkın jî bi gotara xwe ya bi sernavê ‘Heqîqeta ku Hatîye Înkarkirin: Kurdsitana Bakur a Kolonyal’ ya di *Kovara Lêkolînên Kurdî* de hatîye weşandin li ser kolonyalîzmê û li ser kolonyalîzma li Kurdistanê xebata xwe kirîye. Li gor wê, peyva kolonyalîzmê jî zimanê fransî derbasî tirkî bûye û zêdetir di warê akademîk de tê bikaranîn. *“Têgiha kolonyalîzmê (colonialism) ewilî serwerî, serdestî yan hukimkirinê (domination) û bi taybetî jî hêz û desthildarîyê (power) îfade dike.”* (Yarkın, 2020: 50). Zêdetir li ser kolonyalîzma ku piştî newete-dewletan rû daye disekine û li gorî wê tê îddîakirin ku çend cureyên kolonyalîzmê hene. *“Tê îddîakirin ku şeklên cuda yên wekî kolonyalîzma akincitîyê (settler colonialism), kolonyalîzma kedxwarîyê (exploitation), kolonyalîzma wekaletîyê (surrogate colonialism) û kolonyalîzma navxweyî (internal colonialism) hene.”* (Yarkın, 2020: 51). Di kolonyalîzma akincitîyê de ji metropolê gelek mirov ji bo ku li kolonîyê bimînin û ji çavkanîyên wê sûd werbigirin koçî kolonîyê dikin. Di kolonyalîzma kedxwarîyê de ji metropolê kêr mîrov koçî kolonîyê dikin ji bo ku çavkanîyên maddî hinardeyî metropolê bikin. Di kolonyalîzma wekaletîyê de dewleta kolonyalîst, komên ku ne aîde etnîsîteya serdest in koçî kolonîyê dike û li wir dide bicihkirin. Di kolonyalîzma navxweyî de jî di nava yek welatî de metropol li ser perîferîyê zextan dike da ku ji perîferîyê keresteyan bo metropolê bê veguhestin.

Bi awayekî gelemperî mirov dikare bibêje ku kolonyalîzm dagirkirin, hegemonya û desthilatdariya hêzdar û serdestan e ya li ser millet, welat û dewletên bêhêz û bindest. Ku wisa be mirov dikare bêje ji dîroka mirovahîyetê vir ve her bi awayekî kolonyalîzm hebûye, heye û dê hebe.

1. 2. Postkolonyalîzm

Bi awayekî zelal wexta ku statuya kolonyalîzmê kuta dibe piştî pêvajoya postkolonyalîzmê dest pê dike. Lê gava ku welatek an civakek ji kolonîzasyonê xilas dibe bi yekcarî ji tesîrên kolonîzasyonê yan jî ji pêwendîyên kolonîzasyonê xilas nabe. Wekî Loomba jî amaje pê dike;

“Welatek dikare hem postkolonyal be (bi awayekî şeklî di wateya serxwebûnê de), di heman demê de hem jî dikare neokolonyal be (di wateya pêvegirêdabûyîna de bi awayê aborî û çandî).” (Loomba, 2000: 25). Wer xuya ye bi kutabûna kolonyalîzmê re di welat, civak û kesayetên kolonîzekirî de kolonyalîzm bi yekcarî safî nabe, bileks hin semptomên texrîbatan û trawmayên kolonyalîzmê şûnde dîyar dibin û derdikevine mexderê û dibine sedemên gelek alozîyên mezin. Jixwe Loomba jî vê rewşê dupat dike û wiha destnîşan dike: “*Wekî ku hinek kes difikirin ku divê mirov postkolonyalîzmê ne tenê wek rûdanên ku herfiyên li piştî kolonyalîzmê rû didin û ne jî wekî rewşeke ku mirina desthilatdariya kolonyalîzmê nîşan dide destnîşan bike, lê wekî ku bi awayekî nerm berteka li hember tehekuma kolonyalîzmê û mîratên curbicur ên ku kolonyalîzmê li dû xwe hîştine bifikire dê kêrhatîtir be.*” (Loomba, 2000: 29). Ji ber wê ye Ravi Bhorkar di gotara xwe de ku wergera wê Ferzan Şêr kirîye pênaseya postkolonyalîzmê wiha dike: “*Postkolonyalîzm rabêjeke rewşênbirî ye ku bertek û analîzkirina mîrata çandî ya ji kolonyalîzm û emperyalîzmê pêk tê.*” (Bhorkar, 2014: 86)

Wisa xuya dibe ku xebatên li ser postkolonyalîzmê û teorîya postkolonyalîzmê gelekî berbelav in û pênaseya wan jî nêzî hev in. Remezan Alan jî teorîya postkolonyalîzmê wiha rave dike: “*Postkolonyalîzm, teorîyeke edebî, hunerî, zimannasî, felsefî û dîrokî ye ku pîrsgirêk û temayên mîrasa mêtîngehan ji xwe re dike derd û warê lêkolînê.*” (Alan, 2015: 198). Têkilîya teorîya postkolonyalîzmê bi edebîyatê ve wiha girêdede: “*Ji aliyê edebiyatê ve hem rexnekirina berhem û temsîlên wan berhevan in ku ji dewra mêtinkarê Ewropî mane û hem jî bipîrsgirêkkirina edebiyata welatîyên metropolê ye.*” (Alan, 2015: 198). Lê helbet, “*Armanca sereke ya teoriya postkolonyal, guhertin û dekolonîkirina ‘fehma Rojavayî’ ye, deşîfrekirina gotar û têgehên wî yê hegemonîk in. Ji ber vê yekê jî ev teorî berê xwe dide cureyên avakirina hegemonyayê û têgehên wek zayendî, nijadperestî, netewetî, mêtinkarî, koletî, pişafîn, avakirina nasname û gotara ‘yên din’ ên ku di vê pêvajoyê de rolekê dilîzin.*” (Alan, 2015: 198)

Herwiha Ronayî Onen jî pênaseyeke nêzî ya Remezan Alan dike, “*Têgîna post-kolonyalî ji destpêka têkilîya kolonyal û pê ve tê wateya hemî aliyên pêvajoya kolonyal. Di nava teoriyên post-kolonyal de nîqaşên der barê tecrubeyên cuda cih digirin: Koçberî, zordarî, berxwedan, cudahî, nijad, zayend, cih û war; û bersivên li hember vegotinên bandordar ên cihana împeryal ên wekî dîrok, felsefe û zimannasî; û tecrubeyên radîkal ên axaftin û nivîsandina ku ev hemî zindî dibin.*” (Onen, 2018: 45-46).

Ji bo dekolonîkirina fehma Rojavayî û deşîfrekirina gotar û tegihên wê yê hegemonîk wexta ku em berê xwe didin Dilawer Zeraq, li gor wî gelek pêkanînen mêtîngerîya rengmodern hene ku piştî sepanîna van pêkanînan li ser mirovên mêtîngehê, mirovên mêtîngehê tûşî nebanîbûnê (alienation), durehîyê (melezî) û cewêlekîyê (subaltern) dibin. Pêkanînen mêtîngerîya rengmodern yê ku behs jê hat kirin ev in: Yekzimanî, yekdestkirina agahîyê, yekçandî, dîkekîrîn, yekzaravî û asîmîlasyon e.

Di pêvajoya postkolonyalîzmê de di deşîfrekirina gotar û tegihên hegemonîk ê kolonyalîzmê de Albert Memmi jî gelek tiştan destnîşan dike. Di çarçoveya pêkanînen kolonîzekeran ên li ser mirovên mêtîngehê de Albert Memmi destnîşan dike ku: “*Pêngava ewil ji gelek înkariyan pêk tê. Mirovê kolonîzekirî ev tişt nîne, ew tişt nîne. Tu wextî bi ferasetê mirovane têkilî pê re nayê danîn.*” (Memmi, 1996: 84). Herwiha tiştê herî xirab a ku li mirovê hatîye kolonîzekirinê tê sepanîna, “*dûrxistina wî ya ji dîrok û civaka wî ye.*” (Memmi, 1996: 90). Bi vî awayî mirovê ku tê kolonîzekirinê reh û qurmên wî yê civakî û

dîrokî tîn birrîn, ji wan reh û rîşalan mehrûm dibe û di axirîyê de li xwe, li civaka xwe û li dîroka xwe neban dibe. Wexta ku bi vî awayî muamele bi mirovên mêtîngerîyê re tê kirin, “ew xusûsîyetên ku mirovê tê kolonîzekirin dike mirov yek bi yek jê diçe.” (Memmi, 1996: 85). Lê gelo ji bo ku mirovê kolonîzebûyî rabe ser xwe, li koka xwe vegere û li ber xwe bide rêya çareserîyê çî ye? “Em dizanin ku mêtinkarî ji aliye maddî ve insanên xwecih dike, ji bo ku ew kes ji aliye manewî ve jî nemire, şoreş şert e.” (2015: 202)

Li gorî Frantz Fanon hêzên kolonyalist, welatê ku dixwaze kolonîze bike ewilî bi awayekî fîzîkî wan ji xwe cuda dike. “Dinyaya mêtîhgehê beş bi beş e, ji navê ve bûye du parçe: Xetên wan, sînorên wan bi artêşan bi qereqolên polêsan hatine dîyarkirin.” (Fanon, 1985: 47). Herwiha hêzên kolonyalist ji bo ku tirs û xofekî têbixê nava dil û mêjîyê mirovên mêtîngehê hêz û quweta xwe bi awayekî eşkere teşhîr dike. Lê wekî Fanon amaje pê kirîye hêzên kolonyalist dizanin ku bi tenê bi cendîrme û polêsan mirovên mêtîngehê nayên zeftkirin. Ji ber wê jî, “Kolonîzeker, ji bo îfadekirina xusûsîyeta totalîter a kolonîzasyonê ya ku di mêtîngehan de rû dide, mirovên mêtîngehê wekî ‘sembola xirabîyan’ nîşan dide.” (Fanon, 1985: 50). Lê hêzên kolonîzeker ji bo ku bigihîjin armanca xwe, wexta ku behsa mirovên kolonîzekirî dikin bi zimanekî zoolojîk behs jê dikin. Mebesta kolonîzekeran ew e ku mirovên mêtîngehê wek mirovine dermîrovî nîşan bidin. Ji bo vê jî “bi awayekî eşkere, mirovê ku kolonîze dikin dixine asta heywanan.” (Fanon, 1985: 51). Lê wexta ku mirovên kolonîzekirî carinan serê xwe radikin û diqilqilin, kolonîzeker, bi awayekî hiş û mêjîyên wan manîpule dikin. Hişên wan wisa tevlihev dibe ku wextekî şûnde dixwazin bikevine şûna kolonîzekeran. Lê tenê rêyeke çareserîyê û berevajîkirina vê rewşê heye ku ew jî li gor Fanon şidet e, şideta mêtîngehan a li hember kolonîzekeran.

Wekî ku xuya dike ku postkolonyalîzm ji layê gelek teorîsyenan ve hatîye pênasekirin, lê mirov dikare wek teorî an jî rexneyeke ku jihevveçirrandin, deşîfrekirin û analîzkirina pêkanînên wekî dagirkirin û hegemonya ya dewra kolonyalîzmê ya li ser millet, welat û dewletekî pênase bike. Herwiha mirov dikare postkolonyalîzmê, pêkanînên dewra kolonyalîzmê yên fîzîkî yên wekî dagirkirin, kuştin, qetlî‘amkirin, talankirin, sirgûnkirin, koletî û hwd. an jî têgihên hegemonîk ên wekî asimîlasyon, nebanîbûn, melezbûn, cêwelekbûn, zayend, nasname û hwd. di warê dîsîplînên curbicur de bi awayekî arkeolojîk û dekonstruksiyonîst vedikole, pênase bike.

2. Rewşa Kurdistanê di Çarçoveya Kolonyalîzm û Postkolonyalîzmê de

Di beşa duyem de çarçoveyê geştî ya kolonyalîzm û postkolonyalîzmê li gorî teorîsyenên sereke yên di vê biwarê de hat danîn. Îcar em ê ka gelo rewşa Kurdistanê çî ye, statuya Kurdistanê çî ye, di vê çarçoveyê de binirxînin. Bêguman wexta ku behsa Kurdistanê û kolonyalîzmê tê kirin di warê akademîyê de yekcar navê Îsmail Beşîkcî û xebatên wî yên pêncî-şêst salên dawî tê bîra mirovan. Li gor Beşîkcî piştî şerê cîhanê yê yekem di bin banê Cemîyeta Neteweyan de statuya kolonîyan hatîye dîyarkirin. Lê wexta ku statuya wan hatîye dîyarkirin ev statu ne ku heta hetayê bê domandin hatîye danan. Yanê, statuya kolonîyan her çî be jî statuyek bûye û domdar nebûye. Statuya kolonîyan, xwedêgiravî piştî medenîkirina xelkên xwecih an jî xelkên kolonîyê ji layê dewletên kolonyalist û emperyalist, piştî de dewletên wan radestî wan bihatana kirin. Jixwe wisa jî bûye û ji ber wê ye ku gelek dewletên Afrîkayî yên kolonîzekirî, piştî şerê cîhanê, wekî Beşîkcî gotîye bê şer û pevçûn, serxwebûna xwe bi dest xistine. Lê, “Çareserîya ku li neteweya kurdan hatîye ferzkirin, çareserîyeke

neguherbar e. Ji neteweya kurdan hatiye xwestin ku heta hetayê wek neteweyeke bêkesayet, kole, beşbûyî, parçebûyî, parvekirî, ji hev tecrîdbûyî bimîne. Ji ber wê, statuya sîyasî ya Kurdistanê ji ya kolonîyan jî jêrtir e. Kurdistan kolonî jî nîne. Kesayetîya Kurdan û ya Kurdistanê tune ye.” (Beşikci, 2015: 30).

Li gorî Beşikci statuya Kurd û Kurdistanê ya li jêr kolonîtiyê, di navbera salên 1915 û 1925an de bi destê dewletên emperyal ên wê dewrê û herwiha bi hevkarîya dewletên herêmî yên ku hevalbendên emperyalîzmê bûne, lê hatiye fesilandin. Statuya Kurdistanê ya li jêr kolonîtiyê bi politikaya *parçe bike, bi rê ve bibe û tune bike* hatiye kirin û Kurd jî ji bo ku vê politikayê hilweşînin ji wê rojê heta îro li ber xwe didin. Lê tê hişê mirovan ka gelo ev rewş çima tenê hatiye serê Kurd û Kurdistanê? “*Sedemên bingehîn ên tûşbûyîneke wiha cîwaz a parçekirin û parvekirina Kurdan, ji zeafan wêdetir têkilîya wê bi rewşa civakî ya wê rojê re, bi hevsengîya hêzên derveyî û hundirîn yê wê rojê re girêdayî ye.*” (Beşikci, 2015: 37)

Herwiha li gor Beşikci ev pêkanînen kolonyal û emperyal gelek tesîrên neyînî yên postkolonyal li ser kesayet, civak û welatên Kurdan hîştine. Mesela “*Di dîroka neteweyekê de tûşbûyîna politikaya ‘parçe bike û bi rê ve bibe’ yek ji bobelateke herî mezin e ku were serê wê neteweyê. Çunkî politikaya ‘parçe bike û bi rê ve bibe’ mêtîyê neteweyê belawela dike, îskeleta wê parçe parçe dike. Neteweya ku derbeke wiha mezin xwarîye, careke din zû bi zû li ser xwe ve nayê.*” (Beşikci, 2015: 33).

Beşikci xusûsen li ser qedexekirinên çand û zimanê neteweya ku tê kolonîzekirin disekine. Li gor wî dewleta kolonyal ji bo ku çerxa xwe ya kolonyalîzmê rihettir bigerîne, ji bo ku neteweya kolonîzekirî bêkok bihêle û bi vî awayî hişmendîya wan a neteweyî qelstir bike û bi temamî ji holê rake dest davêje van pêkanînan. Çunkî dewleta kolonyal dizane ku wexta neteweya kolonîzekirî bigihîje hişmendîya xwe ya neteweyî dê li hember wî serî rake. Herwiha qedexekirina çand û zimanê wekî ku zimanê mirovekî bê jêkirin, wekî ku kesayetîya wan a civakî û rûhî bê parçekirin dinirxîne. Bi vî awayî mirovê kolonîzekirî xwe kêmînxir û mirovên kolonîzeker jî ji xwe mezintir dibîne. Bi vî awayî kolonîzeker rihettir çerxa xwe ya kolonîzasyonê digerîne. “*Qedexekirina zimanê kurdî, astengkirina vekolînen ziman, çand û edebîyata kurdî, qedexekirina yasayî ya dîroka kurdî, astengkirina jiyîna çanda kurdî divê di vê çarçoveyê de bê nirxandin.*” (Beşikci, 2015: 42)

Lêkolerekî din ê ku di van sih û çil salên dawîyê li ser meseleya Kurd û Kurdistanê û herwiha li ser meseleya mustemlekekirina (kolonyalîzm) Kurdistanê xebitîye Mehmet Bayrak e. Mehmet Bayrak xebatên xwe yê di vî warî de hemûyan li ser arşîvên dewletê dike. Yanî bingeha xebatên xwe li ser belge û dokumantên dewletê yê bi maxreca ‘herî bi xef’ ava kirîye. Li gorî wî, hemû şîfreyên meseleya Kurdistanê Bakur di Plansazîya Islaheta Şerqê de mewcûd in. “*Navê vê plansazîyê yê resmî Plansazîya Islahetê ya Şerqê ye ku mebesta tunekirina naznava kurdî û kolonîzekirina Kurdistanê bi rêya birêveberîyên leşkerîyê hatiye amadekirin.*” (Bayrak, 1999: 67). Bi biryarnameyê hikûmetê ewilî komîsyonek tê avakirin. Komîsyon bi Serokê Meclisa Tirkîyê û mebûsê Çankirîyê Abdulhalik Renda, bi Wezîrê Daxiliyê û mebûsê Tekirdağê Cemal Ubaydin, bi Serfermandarê duyem Kazım Orbay pêk tê. Herwiha Wezîrê Edaletê Mahmut Esat Bozkurt û Serokê Ocaxên Tirkan Hamdullah Suphi Tanrioer beşdarî vê komîsyonê dibin. Plansazîya Islaheta Şerqê piştî xebata vê komîsyonê derdikeve meydanê. Wexta ku mirov xal bi xal dêna xwe dide vê plansazîyê, mirov dibîne ku ev plansazî bi awayekî eşkere li ser asîmîlekirin û tunekirina naznava kurdî û bi awayekî mustemleke birêvebirina Kurdistanê hatiye amadekirin. Ev plansazî bi taybetî li ser rapora

Serokê Meclisa Tirkîyê û mebûsê Çankirîyê Abdulhalik Renda û rapora Wezîrê Daxilîyê û mebûsê Tekirdağê Cemal Ubaydîn hatîye amadekirin. Cemal Ubaydîn di rapora xwe de eynen wiha dibêje: *“Kurdistan divê bi walîtîya umûmî û bi awayekî mustemleke (kolonî) bê birêvebirin.”* (Bayrak, 1999: 274). Jixwe piştî vê plansazîyê li Kurdistanê di sala 1927an de birêveberîya orfî tê îlankirin û Kurdistan bi destê walîtîyên umûmî tê birêvebirin.

Herwiha di van salên dawîyê de akademîsyen Barîş Ünlü jî wekî ku di pêşgotina kitêba xwe de jî dibêje ji tecrubeyeke xwe ya takekesî şûnde dest bi gelek xebatên akademîk ên li ser tirk, tirkîti, kurd, kurdîti û yê din dike. Çarçoveya xebatên xwe li ser têgiha ‘peymana tirkîtiyê’ ava kirîye. Li gor wî tirkîti; etnîsîte, hemwelatî, nasnameya neteweyî û herwiha aidîyeta îdeolojîk nîne. *“Tirkîti, wekî ku li cem gelek tirkan tê çavdêrîkirin, her çi qas li gor hin çînên civakî û aidîyetên îdeolojîk biguhere jî, bi xuyabûna hevbeşî û hevparîyên ji çîn û îdeolojîyan wêdetir, rewş û dirûvên eyan ên wekî dîtin, bihîstin, têgihîştin, agahdarbûn, eleqedarbûn, hestîyarbûn, helwest nîşandan e.”* (Ünlü, 2018: 13). Ev hal û rewşên tirkîtiyê bi awayekî jixweber tê hînkirin û tê nîşandan. Ji ber ku mirov van hal û rewşên tirkîtiyê cihê ku lê ji dayîk bûye, cihê ku lê mezin bûye, yanî di nava civaka xwe de û herwiha bi alîkarîya sazî û dezgehên wekî malbat, dibistan, camî û leşkerî û hwd hîn dibin û wisa tevdigerin. Herwiha civak jî wan hal û rewşên tirkîtiyê ji wan kesan hêvî dike. Lê kesên ku li derveyê serdestîya tirkîtiyê jîyana xwe diborînin ên wekî Kurd û Ermenan wexta ku dikevî nava serdestîya cihê ku tirk lê dijîn an jî gava ku diçîne sazî û dezgehan bi zanebûn wekî tirkan diaxivin, tevdigerin, kincan li xwe dikin. Lê wexta ku vedigerin cih û mekanên xwe, cilûberg/rûpoşên tirkîtiyê ji ser xwe davêjin û vedigerin eslê xwe. Ew kesên ne tirk lê wekî tirkan tevdigerin mecbur in reftarine wisa bikin ji bo ku jîyana xwe berdewam bikin.

Barîş Ünlü cudatîya tirkbûn û netirkbûnê bi têgiha ‘peymana tirkîtiyê’ rave dike. *“Ev têgih, amaje bi hinek peymanên bingeîn û qaîdeyên di navbera civak û dewletê de û di nava civakê bi xwe de dike ku gelek ji wan nenivîskî ne lê hin belgeyên nivîskî jî tê de hene.”* (Ünlü, 2018: 14). Li gor Ünlü sê xalên bingeîn ên vê peymanê hene. Yek jê ew e ji bo ku mirov li Tirkîyeyê di nava ewlehîyê de û bi awayekî îmtîyazane bijî divê mirov tirk û musulman be. Xala duyem, bi awayekî mutleq qedexekirina axaftin, hestpêkirin û di leh de polîtîkakirin e di derbarê kirinên Osmanîyan û kirinên Tirkîyeyê yê li serê xeyrîmuslîman hatine kirin. Xala sêyem jî bi awayekî mutleq qedexekirina axaftin, hestpêkirin û di leh de polîtîkakirin e derbarê kirinên li serê komên musulmanan hatine kirin û bi taybetî kirinên li serê kurdan hatine kirin. Ji ber ku kurd bi awayekî bibiryar û bihêz li dijî tirkkirinê serê xwe xwar nekirine û têkoşîyane. Herwiha ‘peymana tirkîtiyê’ bi sîstema xelatkirina maddî û manewî û herwiha cezakirina maddî û manewî dixebite. Yê ku rîayet dikin tene xelatkirin û ji her cure îmtîyazan sûd werdigirin, lê yê ku îtîbar nakin bi her awayî tene cezakirin û ji her cure îmtîyazan tene mehrûmkirin. Li gorî wî, ‘peymana tirkîtiyê’ di tarîxa Tirkîyeyê ya modern de wekî qanûneke esasî ya nenivîskî lê ji ya nivîskî jî tesîrtir û karîgertir e.

Xusûsen di derbarê her sê xalên bingeîn ên ‘peymanê tirkîtiyê’ de li gel hal û rewşên tirkîtiyê yê erênî yê wekî dîtin, bihîstin, têgihîştin, agahdarbûn, eleqedarbûn, hestîyarbûn, helwestnîşandan; herwiha di derbarê heman xalan de hal û rewşên tirkîtiyê yê nerênî yê wekî nedîtin, nebîhîstin, tenegehîştin, agahdarnebûn, eleqedarnebûn, hestîyarnîşandan, helwestnîşannedan jî hene. Her çi qas rewşên tirkîtiyê yê neyînî wekî kêmasîyekê xuya bibe jî di esasê xwe de ev rewşên neyînî jî îmtîyazên maddî û manewî ne. *“Ancax kesekî mensûbê koma etnik a serdest dikare eleqedar nebe bi yê bindest re, dikare guh nede fikrên wan,*

dikare wan nebihîze; çunkî ji bo van tiştan hêza wî heye û ji ber kirinên wî tişteki ku ji kîsikî wî here tune. Lê yê bindest mecbur in bizanin ku yê serdest çi difikirin û çi dibêjin; çunkî ev agahî ji bo ku jîyana xwe bidomînin û li ser darê pîya bimînin şertekî bingehîn e ji bo wan.” (Ünlü, 2018: 17). Herwiha ev hal û rewşên neyînî yê tirkîtiyê bi sazîyên wekî siyasî, dîyanet, edalet, medya, zanîngeh û bi malbatê ve ku ew jî parçeyekî ‘peymana tirkîtiyê’ ne hatine muhkemkirin.

Li gorî akademîsyen Gullistan Yarkinê jî kolonîzkerina Kurdistanê hê di dema Osmanîyan de dest pê kirîye. Osmanî wexta ku li hember kolonyalîzma Ewrûpîyan têdikoşîyan li alîyekî ve jî heyranê polîtîkayên wan ên modernîzm û kolonyalîzmê bûne. Dewleta Osmanî di sedsala 19an de wexta ku li ser erdên ku di bin serdestîya xwe de polîtîkayên merkezîkirinê dimeşandan, polîtîkayên wan dişibîya polîtîkayên kolonyalist ên ewrûpayê. Li gorî Yarkinê, dîroknas Selim Deringil van polîtîkayên merkezîkirin/medenîkirina Osmanîyan ên li ser perîferîyê wekî ‘kolonyalîzma deynkirî/teqlîdî’ pênase kirîye. “*Deringil, kolonyalîzma Osmanî ya sedsala 19an wekî ‘kolonyalîzma deynkirî’ pênase dike, herwiha ji ber xusûsiyetên wê yê ‘deynkirî’ an ‘teqlîdî’ zehmet e ku mirov vê kolonyalîzmê bi yê împaratorîyên sinai yê agresîf ên ewrûpayî muqeyese bike.*” (Yarkin, 2020: 52). Mebesta kolonyalîzma Osmanî medenîkirina ‘weşîyên’ koçer û eşîretên perîferîyê ye. Ji ber medenîkirin/ehlîkirina eşîretên ereb, kurd û arnawûdan di dema Ebdulhemîdê Duyem de ‘Mektebê Humayûn ên Eşîretê’ hatine damezîrandin. Li gorî Gullistan Yarkinê Dewleta Tirkîyeyê jî li ser mîrasa kolonyalîzma Osmanî ya bi navê medenîkirinê hewldanên xwe yê kolonyalîzmê berdewam kirîye.

Lê ji alîyekî din ve her çiqas kêmbin jî, hin xebatên wekî xebatên Lêkolînên Madûnan (Subaltern Studies), Lêkolînên Sipîbûnê (Whitness Studies), ên li ser kurdan hatine kirin jî hene. Mirov dikare van xebatan wekî xebatên postkolonyal/dijkolonyal jî binirxîne. Ji van cure xebatan ên li ser kurdan yek jê ya Barîş Ünlü ye ku me behs jê hatiye kirin. Yek jê gotara Şaro I. Garib e ku em ê paşê behs jê bikin. A din jî gotara Zozan Goyî ye ku li ser têgiha ‘Kolonyalîzma Mîmetîk’ xebata xwe kirîye. Wekî ku Goyî behs jê dike, têgiha kolonyalîzma mîmetîk/teqlîdî ji teorîya edebîyatê ya ‘arezûya mîmetîk’ ya Rene Girard wergirtîye. Têgiha kolonyalîzma mîmetîk/teqlîdî ya Goyî ku maneya wê nêzikî têgiha ‘aqlê protez’ ya Şaro I. Garib e tê maneya; “*handerên fikr û dinamîzma siyasî ya piranîya neteweya kolonîzekirî ji tevgerên siyasî ya neteweya serdest e.*” (Goyî, 2020: 292). Yanî kurd di nav şert û mercê kolonîzasyonê de bi hişmendîya xwe ya manîpulekirî û sabotekirî êdî bi şeklekî otokolonîzasyonê xwe bi xwe kolonîze dibin. “*Ne tenê dagirkirin û talankirina kolonîzasyonê, lê ji wê ciddîtir heqîqeta herifandin û manîpulekirina zêhnên êdî ji tesîr û encamên fîzîkî yê kolonîzasyonê zêdetir li ser tê sekinîn.*” (Goyî, 2020: 294).

Zozan Goyî bi têgiha ‘hişmendîya dualî’ ya W.E. B Du Bois rewşa kolonîzasyonê kurdan dinirxîne. “*Hişmendîya dualî hişmendîya kolonîyê ye ku bi çavê yê din li xwe mêze dike û xwe bi nirxên yê din ê ku bi heqaret lê dinêre dipêve û ji ber vê hişmendîyê kolonî hema wisa wekî xwe dimîne, xwe nas nake.*” (Goyî, 2020: 295). Kurd jî her çiqas li hember kolonyalîstan têbikoşin jî wextekî şûnda bi çavên wan li xwe dinîhêrin, bi pîvanên wan xwe dinirxînin. Ji ber wê ye Ngûgi wa Thiong’o dibêje, kolonîzasyonê ekonomîk û siyasî bi kolonîzekirina hişmendîyê pêk tên. Ji bo wê divê mirov ewilî zêhna xwe ji nêrînên kolonyalîstan rizgar bike.

Şaro I. Garib bi têgiha ‘aqlê protez’ self-kolonîzasyonê Kurdan rave dike. “*Sedsal e Kurd jî li hember kolonîzasyonê şerê de-kolonîzasyonê (xilasiya ji mêtîngerîyê) didin lê mêtînger jî bi*

teknolojîyên koledariyê yên nû, pêvajoyeke re-kolonîzasyonê (jinûve mêtîngehkirin) pêk tînin. Ji bilî re-kolonîzasyon û de-kolonîzasyonê dînamîka sêyem a naxweyî ya kûr wek kurme darê self-kolonîzasyon (xwe bi xwe mêtîngehkirin) xetera herî mezin e.” (Garib, 2018: 31). Kolonyalist her çiqas welatan zêft bikin jî her daîm tîrsa wan a serhildanên mêtîngehan heye. Ji ber wê kolonyalist jî wekî çareyeke kokbir, zêhn û hişê mirovên kolonîyê manîpule dikin û dişewişînin. Hiş û aqilê protez ên mirovên mêtîngehê bi taybetî di dibistanan de li hiş û aqilê wan tê zerkkirin. Di dibistanê de bi zordestîya zimanê serdestan, zor û tehekuma dewletê di hişê wan de mezin dibe û bi qedexekirina zimanê wan yê dayîkê jî tunekirina kesayet û nasnameya wan rû dide.

3. Rengvedanên Postkolonyal û Dijkolonyal di Helbestên Rênas Jiyan de

3.1. Ekoleke Postkolonyal û Dijkolonyal a Ramanî û Hunerî ‘Çîrûskîzm’

Me ewilî çarçoveyeke giştî ya kolonyalîzm û postkolonyalîzmê kir. Piştî di çarçoveya kolonyal û postkolonyalîzmê de rewşa Kurdistanê bi taybetî jî ya Kurdistanê Bakur destnîşan kir. Niha em ê rengvedanên postkolonyalîzmê an jî dijkolonyalîzmê di helbestên Rênas Jiyan de analîz bikin. Ji bo wê jî em ê her pênc kitêbên helbestan ên Rênas Jiyan ên bi navê *Janya, Diêşîya, Mexzena Xwînê, Dîn û Şîn û Berfwerînê* analîzên xwe bikin.

Wekî ku tê zanîn di navbera vegotinên wêjeyî û rewşên politîk de bîvê nevê pêwendî û tesîrên wan çêdibin. Rewşa şexsî, civakî, sîyasî û heta rewşa gerdûnî tesîra wê li ser vegotinên edebî çêdibe. Remezan Alan vê rewşê wiha dupat dike: “*Ger çand û edebiyat û helbet her cure vegotin (discour), warên notr bûna, mirov dikariya meselê ji aliyekî teknîkî de çareser bikira. Lê ne wisan e. Qey nebe ji Michel Foucault û Edward Said vir ve em dizanin ku bo tehekkumê vegotin jî dibin çek. Ev jî li cîkî, kesên ku Fanon, Memmi û Aime Cesaire xwendibin, dikarin li welatekî kolonyal, karanîna çand û edebiyatê ji hal û hewalê derûnekî bindest azad bibînin?*” (Alan, 2009: 74). Em ê li dû bikevin ka gelo vegotina helbestên Rênas Jiyan wek warên notr mane yan li dijî tehekkumê (kolonyalîzmê) wekî çekekî hatine bikaranîn an na?

Berîya ku em rengvedanên kolonyalist, postkolonyalist û dijkolonyalist di helbestên Rênas Jiyan de destnîşan bikin, divê hinekî li ser ekola çîrûskîzmê ya ramanî û hunerî ya Rênas Jiyan bisekinin. Herwiha li ser têkilîya çîrûskîzmê bi kolonyalîzm, postkolonyalîzm û dijkolonyalîzmê an jî bi dekolonyalîzmê re rave bikin. Di Kovara *Wêje û Rexneyê* de Serdar Ay bi Rênas Jiyanî re heypeyvînekê dike. Di wê heypeyvînê de li ser pîrsa Serdar Ay a derbarê têkilîya kolonyalîzm, postkolonyalîzm, dijkolonyalîzm, dekolonyalîzm, feodalîzm û çîrûskîzmê de Rênas Jiyan bersivên wiha dide: “*Çîrûskîzm ‘Bîr’ek e, ‘Bîr’ raman e, kengî raman û felsefeyeke mirovî ya bi zimanê wî çêdibe li hemberî kolonyalîzmê bi ser dikeve. Bîra Çîrûskîzmê ya takekesî û neteweyî tez û angaşên kolonyalîzmê pûç derdixe; kolonyalîzm bindestên xwe bê dîrok, bê derûnî, bê-hiş, bê çand, û bê kok nişan dide ji bo ku wan bindest bihêle. Bîra Çîrûskîzmê hiş e, dîrok e, derûnî ye, çand e, kok e. Bîr, yek ji şeş elementên Çîrûskîzmê ya bingeîn e.*” (Ay, 2015: 136). Rênas Jiyan di heman heypeyvîna xwe de di peywenda postkolonyalîzm, dijkolonyalîzm û çîrûskîzmê de wiha berdewam dike: “*Çîrûskîzm bi ‘agir’ û bi ‘bîr’a xwe ekoleke bindestan e. Di Çîrûskîzmê de piştî pêvajoya ‘çîrûskîsyon’ê azadî derdikeve holê, di huner û ramana çîrûskîst de qonaxa nihayî azadî ye. Ma ji têgeha ‘azadî’yê mezintir wekîdîn antî-kolonyal (dijmêtînger) têgeh hene? Çîrûskîzm bi ziman*

(kurdi), bi giyan, bi helwest, bi şewaz û bi hemû alavên xwe sistemeke ramanî ya antîkolonyalîst e.” Ay, (2015: 137).

Wekî ku Rênas Jîyan behs jê dike ekola ramanî û hunerî ya Çîrûskîzmê wekî ekoleke dijkolonyal pênase dike û yek ji şeş elementan a bingeîn ‘Bîr’ê dihesibîne. Ji ber ku wekî di babetên kolonyalîzm û postkolonyalîzmê de jî behs jê hatiye kirin hemû teorîsyen û lêkolerên ku di van babetan de lêkolîn kirine, îlam li ser şewandin û manîpulekirina ‘bîr’, hiş, aqil û hişmendîya mirovên kolonîyê yên bi destê kolonyalîstan hatine kirin rawestîyane. Wekî ku Memmi jî behs jê dike tiştê herî xirab a ku bi destê kolonyalîstan li mirovên mêtîngehê tê sepandin, dûrxistina wan a ji civak û jî dîroka wan e. Kolonyalîst bi hemû hêza xwe bi hemû sazî dezgehên xwe ve hiş û aqilê mirovên kolonîyê manîpule dikin. Wekî ku Şaro I. Garib jî behs jê dike piştî van pêkanînen kolonyalîzmê êdî mirovên kolonîzekirî bi ‘aqilê protez’ an jî wekî Zozan Goyî behs jê kirî bi ‘kolonyalîzma mîmetîk/teqlîdî’ li xwe dinihêrin, civaka xwe û dîroka xwe bi wî hişê manîpulekirî dinirxînin. Çunkî kolonyalîst dizanin ku rojekî mirovên mêtîngehê dê hişyar bibin û serî rakin, ji bo ku pêşîya wê bigirin wekî tevdiereke pêşwext hiş û mêtîyê wan manîpule dikin. Helbet kolonyalîst van pêkanînen xwe bi politikayên asimilasyonê, yên zimankujîyê, bi lêferzîkirina nasname û zimanê xwe pêk tînin. Piştî van pêkanînan di axirîyê de mirovên ji xwe neban, ji civak û dîroka xwe neban derdikevine meydanê. Loma jî Rênas Jîyan hem wekî ekoleke ramanî û hunerî di Çîrûskîzmê de û hem jî di helbestên xwe de zêdetir li ser ‘bîr’ê disekine. Yên ku ‘bîr’a xwe dikolin û lê hûr dibin wek ‘bîrkol’ û yên ku ‘bîr’a xwe nakolin û tê de winda dibin re jî wekî mirovên ‘bîrkor’ pênase dike. Mirov dikare bibêje ku Rênas Jîyan hê di kitêba xwe ya helbestan a yekem de dest bi kolandin û rûxandina ‘bîr’a xwe dike, lê di vir de ji ber ku dest bi ‘bîrkol’yê tê kirin hêj ‘bîr’êke tevlihev heye.

“bi barana werza 5an bişom vî mêtîyî
nizanim ez ê bibim xwedî derûnîyeke çikîsayî?
cilêt di dest de xeratê mejiyê xwe me
rûxuyane zagonên hişmendiyê ji bin ve
serî mîna rojhilata navîn tevlihev
wek raskolnikov hey bi tayê me
evîndarên min giş di bedewiya quasimodo de
awiqîne xew li min
kaprîsên min ên mirinê çêbûne
zayîn trajîk, mirin erotîk bûne
(ez)

(hemû jiyana min di navbera kevanekê de asê bûye)” (Jîyan, 2018: 52)

Ji bilî ‘bîr’ê ew pênc elementên çîrûskîzmê çi ne, çîrûskîsyon çi ye, divê em hinekî behs jê bikin û piştî derbasî nîrxandina helbestên wî bibin. “Wek ekoleke hunerî-ramanî Çîrûskîzm ji 6 hêmanan (elementan) ava dibe: 1. Goşt, 2. Bîr, 3. Çîrûsk, 4. Agir, 5. Êş, 6. Azadî.” (Jîyan, 2016: 50). Ev her şeş hêmanên ekola çîrûskîzmê ya dijkolonyal bi şeklekî rengûawa dibin û her yek ji van elementan têne wateyekê. “Ev hêman bi vî awayî di êkolê de difesilin. Goşt di Çîrûskîzmê de fênomeke bingeîn e, ew ‘tişt’ek e, ew alav an jî objeyek e, wek kevîrekî, wek hesinekî û hwd. Di qonaxa serî de goşt hê nebûye mirov, ger xwe biêşîne wê hêdî hêdî bibe

mirov." (Jiyan, 2016: 50). Mirov dikare hemû hêmanên çîrûskîzmê û herwiha vê hêmanê jî hem layê felsefeyê ve û hem jî layê postkolonyalîzmê binirxîne. Jixwe wek ku gelek teorîyên postkolonyalîzmê jî behs jê kirîye, piştî pêkanînan kolonyalîzmê mirov dibe 'tişt' û heta dibe 'netişt'. Li gor teorîya postkolonyalîzmê jî bo ku mirov rûpoşê 'tiştbûn'ê xilas bibe hewl û xîret divê.

Hêmana çîrûskîzmê ya duyem BÎR e ku me li jor behs jê kiribû. *"Di vî goştî de navendek baş heye, ev navend BÎR e; di goştî de bi navê Bîrê quleke kûr heye ku hîs û ramanên mirovî jê xwedî dibin. Mirov jî bo ku ji xavtiya goştî xelas bibe û dest bi mirovahiyê bike divê guh bide vê Bîrê."* (Jiyan, 2016: 50). Bi awayê postkolonyalîzmê an jî dijkolonyalîzmê gava ku mirov hiş, aqil an jî bîra ku hatîye manîpulekirin bikole jî bo ku tiştên lê hatîye hêvişandin têbigihîje, mirov rastî hin nîşaneyan tê ku Rênas Jiyan wan wekî çîrûskan pênase dike. *"Di vê Bîrê de ÇIRÛSK heye, ev çîrûsk elmasek e. Mirovê ku Bîra xwe bikole digihîje vê çîrûskê û çîrûska wî vêdikeve, yê ku Bîra xwe nekole nagihîje vê çîrûskê û çîrûska wî vedimire. Çîrûsk ronahî ye û ji bo têkbirina xavti û taritiya goştî destpêkeke erênî ye."* (Jiyan, 2016: 51). Lê wekî ku behs jê hatîye kirin, *"mirov jî vê çîrûskê AGIREkî çêdike."* (Jiyan, 2016: 51). Lê wekî ku Rênas Jiyan di kitêba Çîrûskîzmê de bi berfirehî behs jê kirîye, hêmana agir herwiha amaje bi agirê Zerdeştîyê, bi agirê her çar kitêbên pîroz, bi agirê berxwedanê yê Kawayî, bi agirê Prometheusî ku agir yezdanan dizîbû û dabû însanan dike. Li gor teorîya postkolonyalîzmê bi vî şekî amajebûna bi êgir tê wateya berxwedanê, serîrakinê û qayîşkêşanê. Piştî vexistina êgir pêvajoya çîrûskîsyonê dest pê dike. Di çîrûskîsyonê de hêmana ÊŞÊ hêmaneke sereke ye û piştî ve pêvajoyê mirov digihîje hêmana armanckirî, hêmana AZADÎyê. *"Çîrûskîsyon ÊŞ e, çîrûskîsyon bi agirê hundirê Bîra xwe, xwe-qemirandin e, xwe-biraştin e, xwe-êşandin e. Piştî çîrûskîsyonê, goştê xav, tarî û çavbirçî ronî dibe, ji xavtiya xwe rizgar dibe û ji wî tiştê ku goşt bû 'mirov'ek ava dibe; êdî mirov ne goşt e, êdî can e, insan e. Ev avabûn, ev mirovbûn AZADÎ ye."* (Jiyan, 2016: 51).

Mirov dikare teorîya çîrûskîzmê an jî pêvajoya çîrûskîsyonê, li hember xirabkirina (deformasyon) serdest û kolonyalîstan wekî bertekeke postkolonyalîst û dijkolonyalîst, wekî xwejinûveavakirin an jî xweçêkirinê jî pênase bike. *"Bi mînakê aktuvel û birîndar ya Kurd û Tirkên mirov dikare mijarê baştir tehlîl bike. Kurd tene xerakirin û ev xerakirin jî, Kurdan ji xwedabûnê (xwebûnê) dicesîne. Ji lew re jî di civaka Kurdan de kêma kes bi temamî bi tahma û zewka hebûnê dizane."* (Jiyan, 2008: 237). Mirov dikare bibêje Rênas Jiyan çareya vê xerakirinê wekî pêvajoya çîrûskîsyonê di xwe-êşandinê de, xwe bi xwe xwe-çêkirinê de dibîne. *"Kes mirov çênake, mirov ancax bi xwe dikare xwe çêbike, lê bi krîzên zimanê xwe, bi kutana navê xwe yê weke bizmarekî li ser lewheya nasnameya xwe. Kes, ancax bi secereya xwe ya bîra psişik, her bi herf, (bîr)anîn bi (bîr)anîn dikare xwe lê bike, xwe bi nav bike, xwe li xwezayê belav bike."* (Jiyan, 2008: 237).

Rênas Jiyan têkilîya teorîya çîrûskîzmê û wêjeyê, û helbet têkilîya wê bi helbestê ve bi şeklekî girê dide. Wekî ku behs dike têkilîya çîrûskîzmê bi wêjeyê dişibîne rêbaza dekonstruksiyonê (xerakirin) ya Derrîdayî. *"Derrida bi rêbaza dekonstruksiyonê (xerakirin) deqê ji hev dixê, parçe dike, diçirrîne û xwe digihîne xwendina rast a berhemê. Di deqê (tekst) de hinek binyad (struktur) veşartî ne, ev binyad bi rêbaza dekonstruksiyonê deşîfre dibin û nakokîyên wê derdikevin holê."* (Jiyan, 2012: 380). Wekî rêbaza dekonstruksiyonîst a Derrîdayî, Rênas Jiyan jî bi teorîya çîrûskîzmê deqên wêjeyî ewilî xera dike û paşê jî nû ve ava dike. *"Di Çîrûskîzmê de bedena wêjeyî tê jihevexistin; Çîrûskîzm bedenê diçirrîne û*

dadikeve hundirê wê. Di Çirûskîzmê de goşt tê destnîşankirin, xwîn tê tehlîlkin, torr û tîkiliya parçeyan jî nû ve tê şîrovekirin.” (Jiyan, 2012: 380).

3. 2. Rengvedanên Postkolonyal û Dijkolonyal di Helbestên Rênas Jiyan de

Mirov ku bibêje pêjn û pişkên kolonyalîzmê, postkolonyalîzmê an jî dijkolonyalîzmê di hemû helbestên Rênas Jiyan de kêmkirî zêde tînin, belkî wekî angaşteke mezin bê xuyakirin. Lê ev angaşt nayê wê wateyê mirov bibêje ku Rênas Jiyan hemû helbestên xwe li ser bingeha kolonyalîzmê, postkolonyalîzmê û dijkolonyalîzmê ava kirîye. Di hin helbestên wî de amajê pê hatîye kirîye, lê di hinan de rasterast behs jê hatîye kirin.

Wekî ku di beş û binbeşên vê gotarê de jî behs jê hatîye kirin mirov dikare bibêje pêvajoya postkolonyalîzmê, pêvajoya lêkolîn an jî deşîfrasyonên arkeolojîk in ên li ser kesayet, civak û welatên ku bi destên kolonyalîstan hatine kolonîzekirin. Di van lêkolîn û pêvajoyan de pêkanînen hegemonîk ên kolonyalîstan ên wekî nijadperestî, asîmîlasyon, îmhakirin û tunekirina heyînen maddî û manewî, talankirin, kolekirin, wêrankirin, koçberkirin, sirgûnkirina welatîyên kolonîzekirî wekî xebatên arkeolojîk tê destnîşankirin. Tesîr û encamên van pêkanînen hegemonîk ên kolonyalîstan di kesayet, civak û welatê kolonîzekirî de tê destnîşankirin. Lê belê ne tenê pêkanînen hegemonîk ên kolonyalîstan tê destnîşankirin, hin caran jî bertek û helwestên wekî berxwedan, serhildan û şer; herwiha hin caran jî hêvî û daxwazên wekî azadî, serbestî, rizgarî û serxwebûnê tê nîşandan ku em ê wan jî wekî dijkolonyalîzmê penase bikin li gorî çarçoveya vê xebatê.

Rengvedanên deşîfrekirin û destnîşankirina pêkanînen kolonyalîzmê wek xebateke postkolonyal a dîrokî û civakî ya Kurd û Kurdistanê di helbestên Rênas Jiyanî de bi tîkçûn û bidarvekirina Şêx Seîd dest pê dike. Wekî teoriya wî ya çirûskîzmê jî ‘Bîr’a xwe dikole û di bîrkolîya xwe de bi awayekî metaforîk rastî bidarvekirina Şêx Seîd tê.

“.....
/di 1925an de xwîna min dihate daliqandin
Diherikî û digot xwîna min:
“wê neviyên min, min fedîkar dernexin!
.....” (Jiyan, 2018: 14).

Piştî pêkanînen kolonyalîst ên hovanê yê wekî kuştin, qetilkirin û parçekirina laşê mirovan ên li Dêrsimê hatine kirin tê destnîşankirin.

“.....
li dêrsiman bûkên biheml im birin
li ser zayenda dergûşa zikê min
li ser cixareyekê şert tîne girtin
mirovên rû-kirêt jî guhên min
kolyeyan jî xwe re çêdikin
û xwe pê spehî dikan
.....” (Jiyan, 2018: 70)

Wekî ku behs jê hatîye kirin hêzên kolonyalîst jî bo ku tirs û xofê bixin dilên mirovên ku tînin kolonîzekirin an jî mezinahîya xwe di hişên wan de muhkem bikin pêkanînen xwe teşhîr

dikin. Kolonyalist bi vî awayî dil û mêjîyê wan manîpule dikin, wan ji dîrok û civaka wan dûr dixin. Herwiha di pêşgotina helbestê de jî hatîye behskirin, ku bi çavê lawikekî hatîye vegotin, ji tirsra ji ber ku neyê deşîfrekirin li termê kekê xwe yî milîtan xwedî dernakeve. Lê Rênas Jiyan pêkanînên kolonyalîzmê vediçîrîne û radixîne ber çavan bi vegotina xwe ve.

*“wek dir û lûlûyan ku li stûyên keçikan hatibin rêzkirin
di nav çiravê de hatibûn rêzkirin
wek peyvên helbestan ên li ser rûpelan hatibin rêzkirin
çav û devên wan ji xwîn û herrîyê xetimî bûn
sivik bûn ên çê bûn,
devliken, rûlîreqs, dillidîlan bûn
li kêleka hev pal dabûn
bê guh, serî nîv jêkirî,
laş ji birînên gulleyan qulik qulikî
a mê hatibû tecawizkirin bi miritî” (Jiyan, 2018: 74)*

Bi heman mebesta pekanînên kolonyalist a teşîrkirina hêza xwe û a tirsandina mirovên mêtîngehê vê carê jî mirovên mêtîngehê têne daliqandin. Dibe ku bi daliqandinê amaje bi pêkanînên kolonyalist ên hegemonîk ên ku li rojhilatê Kurdistanê têne kirin bike.

*“berî hûn min daliqînin
Ji min re qala genimên spehî bikin
ew genimên ku qedera serê min û wan yek e
ew genimên ku ji kerba min
wê bi stûyên xwe devê tirpanan jê bikin
berî hûn min daliqînin
ji min re qala mêraniya serhildana genimên serjêkirî bikin!...
û heger guleyên we pir bin cercûrek sax li ser hev berdin!
.....(Jiyan, 2020: 55)*

Herwiha êriş û kuştin û qetlîama Roboskîyê û dagirkirina Rojava bi awayekî eşkere wek pêkanîn û talanên kolonyalîstan ên bi salan tê destnîşankirin.

*“Ey gule!
Kuro ev gel e!
Li xwirînî xwîna xortan venexwe
Ma tu nabînî bi salan e waweyl e?
..... (Jiyan, 2020: 65).*

*“Tên. Ji bo ku li darê dinyê, kokên me biqelînin tên.
Tên. Wek di zuhayê de şilavilên ku xwe li avê û
Wek di berfê de reşêleyên ku xwe li rêxê bigirin tê.
Tên. Bê sebr û hedan in,
Di destekî wan de ferman û di yê din de tirpan,
Bi salan e talan e.*

..... (Jiyan, 2020: 71).

Rengvedana pêkanînên kolonyalîzmê û encamên wê yên wêrankirîn û xerakirina mal û xaniyan, bi awayekî hovane parçekirina laşê şervanan û avêtina ser sergoyan di şano-helbesta ‘gûti amîtîs’ de bi awayekî berfirehî û ji hev veçirîn û destnîşankirina xebateke arkeolojîk a postkolonyal hatîye destnîşankirin. Di hin helbestên wî de Kurdistan û axa Kurdistanê rasterast wek welatekî mêtîngeh hatîye destnîşankirin û wekî encamên mêtîngerîyê amaje bi hesta bênasnamebûn û bêwelatbûnê hatîye kirin.

“.....
ev der mêtîngeh e
li serê her neqebê polis hene
li nasnameya min dipirsin
ez destê xwe davêjim bêrika xwe
lê tune ye!
Wek te.
.....” (Jiyan, 2019: 109).

“*alek hatibû çikilandin li ber serê wê*
li ber siya wê alê xirpişibûn ser dilê wê
dest diavêtin wê axê
li ber çavê hemû zarokên wê
hê di kerrika guhê min de dike zingînî qîrîna wê
.....” (Jiyan, 2020: 60).

“*ji girêza mêrkujan gav nayên avêtin li kuçan*
... û kurdistanî min rakişandine çarmîxê
mîna îsayê kurê xwedê...
..... (Jiyan, 2018: 52).

“.....
Ey Kurdistan
Ey agir
Ji bo ku te bikin parçe û dagir
Hov in, êrîş dîkin di dest wan de bîvir
.....” (Jiyan, 2020: 79)

Herwiha rengvedanên pêkanînên kolonyalîst ên wekî bêwelatbûn, koledarî, bindestî, sirgûnkirin û tesîrên wê yên xirab, zîndanîkirin, parçekirina sînoran û tesîrên wê yên xizanî, kolberî, qaçaxçîtî weke xwendineke postkolonyal di helbestên Rênas Jiyan de ji hev hatîye veçirrandin û destnîşankirin.

“.....
ên bê welat ti carî nikarin bextewar bin...

.....” (Jiyan, 2020: 83).

“.....
kole ti carî nikarin bextewar bin...
.....” (Jiyan, 2020: 84).

“.....
bindest ti carî nikarin bextewar bin...
.....” (Jiyan, 2020: 86).

“.....
*li girtîgehên ku ji bêhna deryayan dûr
di nav xwêdana xeyala azadiyê de avjeniyê dikim*
..... (Jiyan, 2018: 70).

“*wexta ku sirgûn dibûm
ku min bizaniya min ê ji dêvla çente li mile xwe
welatê xwe
yanî kurdistan xwe
û aramiya rûyê te
hûn bi xwe re bianiyana
di hundirê qewlikê qur’ana xwe de
çi fê de!...*
.....” (Jiyan, 2018: 70).

“.....
*berxik wek qaçaxçiyên ku leşker li pey wan bin
û xwe bêserî li mayin û hudûdan biqelibînin
bi xezeb xwe li guhanan diqelibînin...*
dîn in!..
.....” (Jiyan, 2018: 17).

“.....
*Ey sînor!
Tu kor bibî, kor
Îro zikê qantirê min a çirîyayî ji min re bûye gor
Xwîna gol*
.....” (Jiyan, 2020: 68).

Rênas Jiyan çareserîya rizgarbûna ji kolonyalîzmê (dekolonyalîzm) piştî xebat û veçîrînên postkolonyalîzmê di yekitîya Kurdan de dibîne bi hemû rengûawayên Kurdan ve.

“*bi devekî hirç
û bi eşîrtiya dilbipirç*

*yekîti ne pêkan e, bavê derewan e
werin em bibin “kurd”
wê çaxê wê kes nikaribe li ber me bêje “kirt”
.....” (Jiyan, 2020: 30).*

Lê ne yekîtiyeke yek reng, yekîtiyeke ji hemû rengên Kurdan pêkhatî dixwaze.

*“destê tenê deng jê nayê
tişt pê nayê
bila hinek ji me kesk bin,
hinek sor bin
û hinek jî zer...
.....” (Jiyan, 2020: 37).*

Lê di helbestên Rênas Jiyan de wekî rengvedan ne tenê pêkanînên kolonyalîzmê an jî ne tenê wekî xebateke postkolonyal deşifrekirina pêkanînên kolonyalîzmê xuya dibin. Herwiha rengvedanên helwestnîşandan, qayîşkêşan, berxwedan, serhildanên dijkolonyal jî bi têra xwe hene. Ger ku mirov li gorî teorîya wî ya ramanî û hunerî û herwiha ya dijkolonyal çirûskîzmê binirxîne, piştî bîrkolîya postkolonyalîzmê, piştî xwe-pijandin û xwe-êşandinê azadî û serbestî tê bi dest xistin. Bi tegihên Derîddayî ve piştî xwe xerakirin û jinûveavakirinê ve, ne xwendineke sethî ya postkolonyalîzmê lê bi xwendineke kûr a pêvajoya postkolonyalîzmê ve, bi bîreke zelal û jinûavakirî ve êdî rengvedanên helwestan ên dijkolonyal di helbestên wî de xuya dibin. Ewîlî serî radikin, li ber xwe didin û paşê li çeper û li meydana şerên rûbirû tê xwestin ji dijminan.

*“berxikên berdûş,
zû ji dergûşên xwe bi dûr ketin
di çardesaliyên xwe de
ji çekên çardehderb çak hez kirin
....” (Jiyan, 2018: 41).*

*“ji bo em li hizûra wan
her tim xûz û stûxwar buna
ezmanê me nizm kiribûn
te serî rakir û
ew ezman parçe parî kir
.....” (Jiyan, 2020: 53)*

*“.....
Ey Kurdistan
Ey doz
Bi soz, bi soz
Em ê ti carî nehêlin ku nizm bibin Zagros
Em ê ti carî nehêlin ku kor bibin Newroz
.....” (Jiyan, 2020: 80)*

“.....
em kurd bi zimanekî çiyayî ji we re dibêjin
li çola xwe vegerin
û heta hûn dikarin qûma xwe bi serê xwe dakin
kevir ji hebên qûmê girantir in
çiya ji çolan bilindtir in
 (Jiyan, 2019: 83).

“*pûtên we,*
potên we,
post û potînên we,
pere û pergala we serê we bixwe
ku bi çek û çefiyekê
ez vî welatî li ser serê we nekim tara bêjingê
bila ez bibim axa binê hêlînê
bila ez bibim pûrt û pemboyê kortika navikekê
” (Jiyan, 2019: 92).

“*werin!*
bi kefa ser devê xwe werin
pê li serê hev bikin û werin
dê weledê xwe bavêjin û werin...
” (Jiyan, 2020: 33).

Encam

Peyva kolonyalîzmê ji peyva latînî ya ‘colonia’yê hatîye dariştin û amaje bi wan hemwelatîyên Romayî yên ku her çiqas ji welêt (ji metropole) dûr hatibin binecîhkirin jî wekî hemwelatîyên Romayî têne hesibandin dike. Lê her çiqas koka peyvê wiha derketibe meydana jî mirov dikare bi awayekî gelemperî bibêje, kolonyalîzm hegemonyaya hêzdar û serdestan e ya ku li ser bêhêz û bindestan. Ku wisa be mirov dikare bêje ji dîroka mirovahîyetê vir ve kolonyalîzm hebûye. Lê teorîsyenên kolonyalîzmê, kolonyalîzmê ya berîya modernîzmê (kapîtalîzmê) û ya piştî modernîzmê ji hev vediqetînin û wisa pênase dikin. Helbet ya piştî modernîzmê sistematîktir û birêkûpêktir bûye. Ji bilî van herdu cureyan hin toerîsyên behsa kolonyalîzma akincîtîyê (settler colonialism), kolonyalîzma kedxwarîyê (exploitation), kolonyalîzma wekaletîyê (surrogate colonialism) û kolonyalîzma navxweyî (internal colonialism) jî dikin.

Armanca kolonyalîzmê ji bo metropolê temînkirina keresteyên sererd û binerd in ji bo kolonîyê. Kolonyalîst ji bo van mebestên xwe ewilî hêz û pêkanînen fîzîkî pêk tînin. Lê kolonyalîst dizanin ku rojekî mirovên kolonîyê dê hişyar bibin û serî rakin. Ji bo pêşîya vî tiştî bigirin dest bi serlêşewandin û manîpulekirina hiş û aqilê mirovên kolonîyê dikin. Ji bo van pêkanînan jî kolonyalîst bi alîkarîya perwerdehiya dibistanî û dînî, bi qedekerina zimanên zikmakî û herwiha bi alîkarîya pêkanînen curbicur hiş û aqilê mirovên mêtîngehê manîpule

dikin û bi vî awayî wan ji dîrok û civakên wan dûr dixin. Bi vî şeklî mirovên kolonîyê ji xwe, ji dîroka xwe, ji civaka xwe neban (alienation) dibin.

Postkolonyalîzm jî ji alîyê gelek teorîsyenan ve hatîye pênasekirin, lê mirov dikare wek teorî an jî rexneyeke ku ji hev veçirrandin û deşîfrekirina pêkanînên dewra kolonyalîzmê pênase bike. Herhiwa mirov dikare postkolonyalîzmê wekî pêkanînên dewra kolonyalîzmê yên fizîkî yên wekî kuştin, qetlî'am, talankirin, sirgûnkirin, koletî û hwd. an jî têgihên hegemonîk ên wekî asîmîlasyon, zayend, nasname û hwd. di warê dîsîplînên curbicur de bi awayekî arkeolojîk vedikole, pênase bike.

Wexta ku mirov di çarçoveya kolonyalîzm û postkolonyalîzmê de li rewşa Kurd û Kurdistanê bi taybetî jî rewşa Kurdistana Bakur dinîhêrê, di warê akademîyayê de kêmkirî hatine kirin. Di vî warî de yên ewilîn xebatên Îsmail Beşikçi ne. Li gorî Beşikçi statuya Kurdistanê tune ye, Kurdistan kolonî jî nîne, statuya wê ji ya kolonîyan jî nizmtir e. Kurdistan di navbera salên 1915 û 1925an de ji layê hêzên emperyal ên Fransîz û Brîtanîyayê ve û her weha bi alîkarîya hêzên herêmî ve hatîye parvekirin, parçekirin û belawelakirin. Lêkolêr Mehmet Bayrak jî di warê kurdolojîyê de gelek xebat kirine û xebatên xwe jî li ser belge û dokumantên dewletê (Tirkîyê) yên bi maxreca 'herî bi xef' ava kirîye. Li gorî Mehmet Bayrak dewlet li gor raporên burokratan komîsyonekî ava dike û di vir de Plansazîya Islahetkirina Şerqê tê amadekirin. Ev plansazî dibe rehbera dewletê ya birêvebirina Kurdistanê û li gorî vê plansazîyê Kurdistan bi awayekî mustemleke tê birêvebirin. Herwiha di van salên dawî de di warê akademîyê de di çarçoveya kolonyalîzm û postkolonyalîzmê de li ser Kurd û Kurdistanê gelek xebat hatine kirin ku me di vê gotara xwe sîd wergirt ji wan. Lêkolînên Dilawer Zeraq, Cuma Çîçek, Remezan Alan, têgiha 'peymana tirkîfîyê' ya Barîş Ünlü, têgiha 'aqlê protez' ya Şaro I. Garib, gotara Gullistan Yarkinê, gotara 'kolonyalîzma mîmetîk' ya Zozan Goyîyê di vê biwarê de xebatên kolonyal û postkolonyal in.

Di biwara kolonyalîzm û postkolonyalîzmê de di helbesta Kurmancî ya nûxwaz de em li ser hemû helbestên Rênas Jiyan xebitin. Rênas Jiyan wekî ku behs jê dike teorîya xwe ya ramanî û hunerî Çirûskîzmê wekî teorîyeke postkolonyal û dijkolonyal jî dihesibîne. Bi teorîya xwe ya Çirûskîzmê ve bi taybetî li dû 'Bîr'a xwe dikeve ya ku ji layê serdest û desthilatdaran ve hatîye şewandin û manîpulekirin. Jixwe şewandin û manîpulekirina bîr, hiş û aqil ji layê gelek teorîsyênên postkolonyalîzmê ve hatîye dupatkirin û lêkolîn li ser hatine kirin. Çirûskîzma Rênas Jiyan bi şeş elementan (goşt, bîr, çirûsk, agir, êş, azadî) pêk hatîye. Di Çirûskîzmê de bi bîrkolîyê ve pêvajoya çirûskîsyonê yanî pêvajoya xwe-pijandin û xwe-êşandinê dest pê dike û di axirîyê de digihîje bîra xwe ya resen ku êdî piştî wê azad û serbest dibe. Wexta ku mirov dêna xwe dide teorîya Çirûskîzmê û xusûsî pêvajoya çirûskîzmê, çawa ku Derrîda bi dekonstruksîyonê (xerakirin) ewilî deqê (tekst) xera dike, ji hev vediçîrrîne û di axirîyê de digihîje binyadên veşartî yên deqê, Rênas Jiyan jî bi wî awayî bi bîrkolîyê û bi pêvajoya çirûskîsyonê ve bîra heyî ya manîpulekirî û şewandî xera dike, ji hev vediçîrrîne û digihîje bîra xwe ya resen. Wexta ku digihîje wê qonaxê êdî azad û serbest dibe û ji nû ve bîra xwe ava dike.

Wexta ku mirov di çarçoveya kolonyalîzm, postkolonyalîzm û dijkolonyalîzmê hemû helbestên Rênas Jiyan dinirxîne, ewilî pêkanînên kolonyalîzmê yên wekî kuştin, qetlî'am, girtin, bidarvekirin, sirgûnkirin, wêrankirin, talankirin û hwd. bi xwendineke postkolonyal wekî ku bîra xwe bikole ji hev vediçîrrîne û radixîne ber çavan. Hin caran bi awayekî zelal ji bo Kurdistanê dibêje ku ev der mêtîngeh e, an jî bi awayekî rasterast behsa bidarvekirina Şêx

Seid, komkujiya Dêrsimê, qetlî'ama Roboskîyê, berxwedana Rojavayê tê kirin di helbestên Rênas Jiyanî de. Herwiha rengvedana pêkanînen hegemonîk ên kolonyalîst ên wekî parçekerîna sînorên Kurdistanê, mayînkirina sînoran, qaçaxçîtî, kolberî, xizanî jî wekî lêkolîneke arkeolojîk a postkolonyal ji hev tê veçirandin û deşîfrekirin. Herwiha rengvedanên encama pêkanînen hegemonîk ên serdest û desthilatdaran ên wekî bênasnamebûn, bêwelatîbûn, bêyekitîbûn jî tê destnîşankirin.

Pîştî destnîşankirin û deşîfrekirina hemû pêkanînen hegemonîk ên kolonyalîstan bi awayê nirxandineke postkolonyal, çawa ku di çîrûskîzmê de pîştî qonaxa çîrûskîsyonê digihîşte qonaxa azadîyê, herwiha pîştî ji hev veçirandin û deşîfrekirina wan hemû pêkanînan digihîje qonaxa dijkolonyalîzmê. Ji ber wê wekî ku hatîye destnîşankirin di gelek helbestên Rênas Jiyan de rengvedanên bertek û helwestên dijkolonyal xuya dibin.

ÇAVKANÎ / REFERENCES

- Alan, R., (2009). Bendname, li ser Ruhê Edebiyatekê. Stembol: Avesta.
- Alan, R., (2015). Destpêkek ji bo Zanista Edebiyata Modern. Stenbol: Peywend.
- Alan, R., & Öpengin, E., (Ed.). (2014). Tîr û Armanc, Gotarên Rexneyî li ser Edebiyata Kurdî ya Modern. Stenbol: Peywend.
- Ay, Serdar., (2015). Li ser Êşê bi Rênas Jîyan re Hevpeyvîn. Wêje û Rexne Kovara Çar Mehane ya Lêkolîn, Rexne û Teoriya Wêjeyê, Cilt 5, 132-145.
- Bayrak, M., (1999). Kürt Sorunu ve Demeokratik Çözümü. Postfach-Wuppertal: Öz-Ge Yayınları.
- Beşikci, İ., (2015). Devletlerarası Sömürge Kurdistan. İstanbul: Roni Basın Yayın.
- Bhoraskar, R., (2014). Nerîneke Postkolonyal li ser The Tempest û Axriyên Wê. Zarema Kovara Çarmehane ya Rexne û Teoriye, (Wer: Ferzan Şêr), (j. 2), 86.
- Cesaire, A., (2007). Barbar Batı, Sömürgecilik Üzerine Söylev. İstanbul: Salyangoz Yayınları.
- Çiçek, C., (2013). Zimanek Çima Tê Qedexekirin, Polîtîkayên Zimanî û Rewşa Kurdî li Tirkîyeyê ji Înkârê ber bi Nasînê. Stenbol: Weşanên Peywend.
- Fanon, F., (1985). Yeryüzünün Lanetlileri. İstanbul: Bir Yayıncılık.
- Garib, Ş. I., (2018). Aqlê Protez ê Kolonîyê. Zarema Kovara Çarmehane ya Rexne û Teoriye, Cilt 13, 30-42.
- Goyî, Zozan., (2020). Mimetik Sömürge. Kürd Araştırmaları Dergisi 2020 Yayın Serisi, Cilt 1-2-3-4, 291-307.
- Jiyan, R., (2012). Çirûskîzm, Li Ser Goşt û Agir û Hunerê Lêkolîneke Fenomenolojîk. Diyarbakır: Belkî.
- Jiyan, R., (2020). Diêşîya. Enqere: Belkî.
- Jiyan, R., (2019). Dîn û Şîn. Enqere: Belkî.
- Jiyan, R., (2018). Janya. Stenbol: Weşanxaneya Belkî.
- Jiyan, R., (2008). Ji Şevê Re, Çend Têgehên Dera Hanê. Stenbol: Belkî.
- Jiyan, R., (2018). Kolleksiyona Çirûskan, Mexzena Xwînê. Stenbol: Belkî.
- Jiyan, R., (2016). Ponijîn. Amed: Weşanxaneya Belkî.
- Loomba, A., (2000). Kolonyalizm Postkolonyalizm. Stenbol: Ayrıntı.
- Memmi, A., (1996). Sömürgeci ve Sömürgeleştirilen İnsan. Ankara: Öteki Yayınevi.
- Onen, R., (2018). Ziman û Netewesazî, Lêhûrbûnek li ser Kovara Hawarê. Stenbol: Weşanên Peywend.
- Ünlü, B., (2018). Türklük Sözleşmesi, Oluşumu İşleyişi ve Krizi. Ankara: Dipnot Yayınları.
- Yarkın, G., (2020). İnkâr Edilen Hakikat: Sömürge Kuzey Kürdistan, Kürd Araştırmaları Dergisi 2020 Yayın Serisi, Cilt 1-2-3-4, 47-71.
- Zeraq, D., (2022). Rengê Hebûnê. Enqere: Weşanxaneya Lîs.